# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (293):

**Pakrewanbûna Kurdekî sivîl bi qurşîna "El'hemzat", revandina xortekî, dijatiyek li ser temenmezinekî Êzdî û hevjîna wî û du zarokên din, girtinine bêsûcane, serpereştvanê komkujiya Newroza Cindirêsê serbest e, kuştina serkirdeyekî Da'işê, şewatin daristanan û pevçûnin di navêna milîseyan de**











Syrian Interim Government
Prime Minister's Office

الحكومة السورية المؤقتة
مكتب الرئاسة

الرقم: / 27 /
التاريخ: 17 حزيران 2024

بيان

حول استهداف مليشيات قسد الإرهابية لمخيم كويت الرحمة في عفرين أول أيام عيد الأضحى المبارك

تعرض مخيم كويت الرحمة في عفرين في الساعة العاشرة من ليلة أمس ١٦ حزيران ٢٠٢٤ لقصف بأكثر من ثلاث قذائف صاروخية مصدره مليشيا قسد الإرهابية، نجم عنه كحصيلة أولية استشهاد رجل واحد وإصابة آخرين.

تأتي هذه الجريمة الجديدة في أول أيام عيد الأضحى المبارك وتزامنا مع أبشع الانتهاكات التي ترتكبها قسد في المناطق المحتلة عبر خطف الأطفال واعتقال النشطاء وإخفائهم قسرا وقتل السوريين تحت التعذيب؛ لتؤكد على حجم الإرهاب الممنهج الذي تحمله هذه المليشيات تجاه حاضر ومستقبل الشعب السوري.

نتقدم بأحر التعازي لذوي الشهيد، ونؤكد على جهوزية الجيش الوطني للرد على هذه الجرائم النكراء وأن كل ما تقوم به مليشيات قسد لن يرهب شعبنا السوري وسيكون مصيرها الزوال مهما طال الزمن.

الحكومة السورية المؤقتة













U.S. Central Command
@CENTCOMArabic

**مقتل مسؤول كبير في تنظيم داعش في غارة جوية للقيادة المركزية الأمريكية في سورية**

في يوم 16 يونيو/حزيران، نفذت القيادة المركزية الأمريكية غارة جوية في سورية، مما أسفر عن مقتل أسامة جمال محمد إبراهيم الجنابي، وهو مسؤول كبير في تنظيم داعش. ستؤدي تصفيته إلى تعطيل قدرة داعش على توفير الموارد وتنفيذ الهجمات الإرهابية.

ستواصل القيادة المركزية الأمريكية، إلى جانب الحلفاء والشركاء في المنطقة، تنفيذ العمليات الرامية إلى إضعاف القدرات العملياتية لتنظيم داعش وضمان هزيمته الدائمة.

لا يوجد ما يشير إلى إصابة أي مدنيين في هذه الضربة.

UNITED STATES CENTRAL COMMAND
القيادة المركزية الأمريكية

تاريخ آخر تعديل ٩:٠٨ م · ١٩ يونيو ٢٠٢٤ · ٧٤ ألف مرة مشاهدة




Li ser bingeha nijadperestî û kîn û quretiya ku Dagîrkeriya Turkiyê û Misilmanên Tundrew û netewperestên tûj li hember Kurdan belav kirine, jiyan û malmewdan û erdnîgariya Kurdan tên yaxmekirin, zincîra tewanên têvel ên ku di dermafê wan de pêk tên nasekine, û kuştina yekser jî jê, ji roja yekê ji dijberiya li ser Herêma Efrînê ve (20.01.2018. Z) û ta roja îro, ji bilî bi dehan dijatiyên rojane yên rengeren.

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Pakrewanbûna Kurdekî sivîl bi qurşîna "El'hemzat":**

Li kat (2) şeva Çarşemê 19.06.2024. Z, giropeke çekdar ji Milîseyên "Tîpa/Firqit El'hemze" li Rojavayê Gundê "Coqê" li ser riya giştî ya dere Gundê "Dargirê" - Navça Mabeta sekinî bû, û qurşîn yekser avêtin du hemwelatiyan "**Cemal Elî kurê Mihemed Gulîn** /27/sal - hevjînkirî û xwediyê du zarokan, **Mihemed Welîd Elîko** /22/sal" ji xelkê Gundê "Dargirê", li dema vegera wan ji karê xwe li Bajarê Efrînê bi matorê dutekerî, û di encamê de mekin birîndar bûn, û ji bo dermankirinê bo Nexweşxana Sûrî ya Pisporî ya taybet li Bajarê Efrînê hatin birin.

Li Şeva Înê jî 21.06.2024an. Z, "Cemêl" ji ber birînê jiyana xwe ji dest da, û "Mihemed" jî hîn di nav nivînan de ye, lê di heman demê de jî Milîseyên "Asyêşa Leşkerî" û Hêza Hevbeş"Firqit El'hemze, Firqit El'sultan Silêman Şah" oda lêsekirinê dorpêç kir û wêne û guhestina nûçeyan qedexe kirin, û dora Gundê "Dargirê" jî xelek girt da ku liv û tevgera hemwelatiyan tengas bikin û bizavên gelêrî qedexe bikin; Û berî wê jî wan ji heman gundî Hemwelatî "**Bekir Ednan Bekir** /25/sal" -bînerê tekane li ser bûyera tewanê- girtibû, yê ku dema ew herdu hatine armanckirin bi matora xwe li piş wan dihat, û paşê jî di bin gefa kuştinê de û bi mercê ku li ser hûrgiliyên tewanê nepeyive ew berdan.

Ew girop ne rêbendeke ewlekarî cihbêlî û naskirî û li cîgeheke normalkirî bû, û tekezkirî ew ji bo dizîn û şelandinê û ferzkirina vêrgiyan an ji bo pêkanîna tewanekê derketibû; Lê Milîseya "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" hewil da ku rastiyan şebeq bike û tewankaran vêguneh derîne, di zelalkirineke belavkirî de li 19.06.2024an. Z, ew bi derew dibêje ew tevî "Hêza Hevbeş" di gereke hevbeş de bûn, ji bo lêgerîna hepisciyekî revî di cejnê de, û endamekî qurşîn avêtin birîndaran, ji ber ku ew li rêbendê nesekinîn! Û wênek du ji endaman re belav kir û got ew sersedemê kuştina "Cemêl" in - li gor Kenala "Heleb El'yewm".

Û termê Pakrewan "Cemal Elî" -di nav hestên xemgînî û xêlîbûnê de- li goristana gundê wî hate oxirkirin, bi beşdariya girseyek ji xelkê, û hildana siloganine li dijî milîseyan, û hine din jî ji bo pesindan û sermedîkirina giyana şehîd.

**= Revandina xortekî Kurd:**

Li roja Çarşemê 26.06.2024an. Z, Xort "**Reşîd Semîr Elî** /23/sal - Malbata Şukrî Mistê Elî" ji xelkê Gundê "Kora" - Navça Cindirêsê li ser destê giropeke çekdar rastî piroseyeke revandinê hat, li dema derketina wî ji dîkana xwe ya cilan/kincan a li ser Kolana "Yalanqozê" li Bajarê Cindirêsê, bi mebesta çûna gundê xwe bi matora dutekerî, û niha ew girop ji bo serbestberdana wî berdêleke diravî mezin dixwaze, û gefa kuştinê da wan ger destlat werin agahdarkirin.

**= Dijatiyek li ser temenmezinekî Êzdî û hevjîna wî:**

Li navîna şeva Şemiyê/Yekşemê 23.06.2024an. Z, giropeke çekdar e rûpeçinandî mala temenmezinê Kurd ê Ezdî "**Cimo Salêh Cimo** /80/sal" li Gundê "Basûfanê" - Şêrewa basmîş kir, çek kişandin wî û hevjîna wî "**Xezalê Derwîş Erebo** /70/sal", û dest û lingên wan girêdan û gefê kuştinê da wan ger bilivin û bikin qîreqîr, paşê jî zêrmêr û tibabeke diravî û du amûrên mobayêl ji wan dizîn, û piştî ew vekirin revî; Bi ser hebûna rêbendeke çekdar e Milîseyên "Feyleq El'şam" li dûrî malê bi dehmitran.

**= Dijatiyek li ser du zarokên Kurd:**

**-** Berî du heftan, çekdarin ji Milîseyên "Ceyş El'şerqiyê" mekin li xortê negîhayî "**Mihemed Ferîd Elî Qesab**" xistin û sixêf jê re dan, li pêş mala wî li ser riya Gundê "Hemamê" - Bajarê Cindirêsê, û li ber çavên merivên wî, û bi ser de jî sixêf ji xwediyên wî û Kurdên Cindirêsê re gotin, bi behaneyeke çêkirî (ku xortê negîhayî sixêf ji Ereban re gotine). Û ew heman Milîseyên ku Komkujiya Newroza Cindirêsê li 2023an. Z di dermafê Malbata "Pêşmerg" de pêk aniye ye.

**-** Li 23.06.2024an. Z, çekdarin ji Milîseyên "Tîpa/Firqit El'hemze" mekin li zarokê sêwî û xwediyê pêdewestiyên taybet "**Ehmed Kamîran Miho** /13/sal" ji xelkê Gundê "Bilêlko" - Navça Reco xist, li nêzîk Dibistana Pêşesaziyê li Taxa Mehmûdiyê - B. Efrînê, û ji bo dermankirinê bo nexweşxaneyekê hate guhestin.

**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên Dagîrkeriyê ev girtin:**

**-** Li 13.06.2024an. Z, Hemwelatî "**Ednan Namî Osman** /26/sal" ê bi "**Armanc**" tê navdan ji xelkê Gundê "Ênhecerê" - N. Mabeta, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Cerablusê" ve, li ser riya vegera wî ji Heleb - aliyê penaberiyê- bo herêma xwe, bi tewanbariya têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser (RX) a berê re; Were zanîn ku ew li ba wê ne karmend bû, û tenê birayê wî "Osman" di refên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) de şervan bû, û li dema şerê dijberiya ser Efrînê de şehîd bû; Û "Asayêşa Leşkerî" hevjîna wî ya ku hevalriya wî dikir berda, û ew jí bêsûcane girtî hîşt; Û were zanîn jî ku bavê "Armanc" li Herêma "Şehba'i" - Gundewarê Heleb a Bakur di temenê /55/salî de mir, ji qehra serpêhatiyên ku gihîştine malbata wî, û diya wî jî bi tena xwe li "Ênhecerê" dijî.

**-** Li 14.06.2024an. Z, herdu bira "**Mihemed** /35/sal û **Fayiq** /33/sal **kurên Zemçî Mûrad**" ji xelkê Bajaroka "Kefirsefrê" - N. Cindirêsê, ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Cerablusê" ve, bê ku sedem werin zanîn; Û "Fayiq" li gorî erêkirineke pêşinde ji "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" ve birayê xwe "Mihemed" (ê ku ji Heleb - aliyê penaberiyê ji sala 2018an. Z ve- vedigerî) pêşewaz kir, û herdu jî li ser riya vegera Efrînê bûn; Û ta niha herdu li Bajarê Cerablusê bêsûcane Girtî ne.

**-** Li 25.06.2024an. Z, Hemwelatî "**Elî Hisên** /40/sal - keyayê gund û piştî rojekê hate berdan, herdu bira **Hisên** /35/sal û **Mihemed** /38/sal **kurên Hesen Hemod**, **Mihemed Cim'e Soro** /40/sal" ji xelkê Gundê "Dêwê Jorin" - N. Cindirêsê, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Cindirêsê" ve, bi sedema daxwazên wan ji malên wan ên desteserkirî ve; Û li roja din dîsa ji heman gundî Hemwelatî "**Yehye Hesen Mihemed** /44/sal, **Welîd Hesen Mihemed** /58/sal, **Xelîl Hesen Mihemed** /52/sal, **Ehmed Mistefa Hemod** /33/sal" bi heman sedemê girtin, û hemî jî bi têkildariyê bi (RX) a berê re tuhmetdar kirin; Û piştî ferzkirina baceyeke diravî li ser her yekî ji wan ew serbest kirin, ji bilî "Hisên Hesen Hemod" ê ku ta niha bêsûcane girtî ye.

**= Vegera tewankar "Ebo Hebîb Xeşam" bo Cindirêsê:**

Dadgeha "Çobanbegê/El'ra'î" - Herêma Babê sezayek darvekirinê -çêdibe were redkirin- derxistibû, li sê tewankaran (**Umer Salêh El'esmer** - zayîna sal 2000 î. Z, **Hebîb Elî Xelef** - zayîna sala 2004an. Z, **Bîlal Ehmed El'bûd** - zayîna sala 2000 î. Z ) di doza komkujiya Newroza Cindirêsê de -sala 2023an. Z- ya ku tê de çar ji Malbata "Pêşmerg" pakrewan bibûn; Lê li vê dawiyê "**Elî Xelef/Ebo Hebîb Xeşam**" -bavê yê diwem- bi behaneya nebesbûna nîşandeyan ew serbest berda, bi ser ku aliyê gilîker gelek bînerdayîn li ser hevkariya wî bi awakî yekser di pêkanîna komkujiyê de pêşkêş kirin, û ew jî ev in: Wî hurhutandin kiriye, çek dane tewankaran, li ciyê tewanê beşdar bû, û piştî cîbicîkirina tewanê jî çek ji tewankaran wergirtibûn û di reva wan de jî alîkarî kiribû, yanê wî yekser serpereştkirin û abonekirina cîbicîkirina tewanê kiribû û bûbû pêkhateyek jê. Û ya bêtir jî piştî berdana "Elî Xelef" ew vegerî û di B. Cindirêsê de rûnişt, û li nav kolanên wê

û li nav endamên Rêbenda "Hec Iskenderê" ya çekdar li Rojavayê Cindirêsê hate dîtin. Û weke berevajîkirinek bi robet ji zagona sezayan a Sûrî re, û herweha ji urf û gerdîşeyên civakî re jî, bi awakî dadmend nehat cezakirin, ji ber ku ew serkêşekî milîseyên bi ser Turkiyê ve ye, û ji aliyê istîxbaratên wê ve parastî ye; Û ya rast û gerek divabû aliyên dadwerî û destlatên xwecihî -bi kêmanî- ew qedexe bikirina ku li ciyê tewan tê de hatiye kirin rûnişta, çimkî dûrahî bandorine metrsîdar ên tewanê hebûn, û bandora wê li Malbata "Pêşmerg" a bêsûc û wate û perensîpên Cejna Newrozê yên şaristanî û rûmeta Gelê Kurd bi giştî hebû, û herweha jî li ser bingeheke nijadperestî û kîndariyeke kirêt pêk hat.

Filtandina "Ebo Hebîb Xeşam" ji sezakirinê û vegera wî nav refên Milîseyên "Ceyş El'şerqiyê" û rûniştina di Bajarê Cindirêsê de, rikberiyeke mezin e ji hest û viyana xwediyên qurbaniyan re, û herweha jî ji Kurdên li dijî komkujiyê derketine xwepêşandanan re, bi taybetî jî yên li hundir; Û weha jî hevojtineke ji pêkanîn û cîbicîkirina tewanin din re.

Were zanîn jî ku tewankar li ba Milîseyên "Tevgera Rizgarkirin û Avakirinê/Herekit El'tehrîr we El'bîna'i" de (ya di nav "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" de ya girêdayî "Hemahengiya Sûr - Ixwanî" ya bi ser Turkiyê ve) endam bûn, û ji Gundê "Xeşam" - Gundewarê Dêrezorê ne.

**= Kuştina serkêşekî "Da'işê":**

Li êvara 16.06.2024an. Z, nûçeyin hatin belavkirin, li ser kuştina kesekî (ku nasnamak kesayetî ji Encûmena Xwecihî li Efrînê ya girêdayî Dagîrkeriya Turkiyê derketî radike) li derdora Gundê "Kiwêt El'rehme" yê niştecîkirinê li Çiyayê Lêlûn - Efrîn, û "Hikometa Sûrî ya Demkî" bi serokatiya "Ebid El'rehman Mistefa" jî daxuyanek taybet bi bûyerê li roja din derxist, û ew bi tewanê da salixdan, û Hêzên Sûriya Demokrat (QSD) bi bombebarankirina gund tewanbar kir, û diyar kir ku mêrek şehîd bûye û hin din jî birîndar bûne.

Lê! Serkirdeya Navendî ya Emrîkî jî li ser Pilatforma "ÊKS/X" li 19.06.2024an. Z got: (ku wê li 16.06.2024an. Z, êrişeke asîmanî li Sûriyê pêk aniye, û di encamê de "**Usame Cemal Mihemed Ibrahîm El'cenabî** (yê Îraqî)" hatiye kuştin, û ew di Rêxistina "Da'işê" de berpirsiyarekî mezin e, û jinavbirina wî kanîna "Da'işê" li ser peydakirina dahatan û cîbicîkirina êrişên terorî lawaz dike...û tu sivîl di vê lêdanê de birîndar nebûne).

Divê were zanîn jî ku "Usame" tevî hevjîna xwe di maleke Gundê "Kiwêt El'rehme" de (yê ku di bin desteseriya "Ebo Yûsêf Meyadîn" de, serkêşekî Milîseyên "Firqit El'hemze") rûdinişt.

Divê bê zanîn jî ku bi sedan ji endamên "Da'işê" -di nav de jî serkêş- revîn Efrîna dagîrkirî, ji bilî herêmên din ên di bin bandorî û Dagîrkeriya Turkiyê de - Bakurî Sûriyê, yan ji bo derbasbûna welatên derve yan jî tevî milîseyên bi ser Turkiyê ve bûn, bi taybetî jî "Ehrar El'şerqiyê" û "Ceyş El'şerqiyê"; Û Hevbendiya Navdewletî li 12.07.2022an. Z, bi piroseyeke cûreyî herdu serkirdeyên Da'işî "**Mahêr El'ûqal û Menhel El'ûqal**" li nêzîk Gundê "Xalta" - N. Cindirêsê kuştin.

Û li 30.04.2023an. Z, Turkiyê jî ragîhand ku serkêşê Rêxistina Da'işê "**Ebo El'husên El'qureşî**" ji nav bir, û avahiyek li ser riya giştî li navêna herdu gundên "Sindiyankê û Miskê Jêrin" - N. Cindirêsê (ya di bin desteserî û parastina Milîseyên "Artêşa El'şerqiyê" de) armanc kir.

**= Şewatên daristanan:**

Ji dema dagîrkeriya Efrînê ve li 2018an. Z şewat pir bûn, bi sedema qutkirina fere û pirbûna bermayên hişk, û agirpêxistina bi mebest ji bo serpeçînandina piroseyên qutkirinê yan jî ji bo hêsankirina derxistina kokên binerd; Û bê piroseyên vemirandina bilez û kêrhatî, ji ber ku Turkiyê û milîseyên bi ser ve jî xwe ji pişikdariyê didin yal, û tenê bi ser Tîpên "Berevaniya Sivîl a Sûrî" yên kanîn nizim de tê berdan.

- Ji destpêka Êvara Sekna Cejna Qurbanê 15.06.2024. Z ve û li dirêjiya sê rojan, li nêzîk sînorê Sûriyê - Turkiyê, li derdora Gundê "**Bêkê**" - N. Bilbilê û berve gundên "Meydana" - N. Reco ve, agiran rûberin mezin ji daristanine xwezayî daqultandin/daqurtandin, ta ku ji xweberê vemirî, piştî hewildanine bê encam ji vemirandina wan re ji aliyê "Berevaniya Sivîl ya Sûrî" ve, û di encamê de ziyan gihîşte zeviyên zeytûna û ji bilî wan darine biber jî.

- Li 15.06.2024an. Z, agirek li daristaneke **Çiyayê Hawarê**/Çê - N. Reco ji nû ve vêket, û Tîpên "Berevaniya Sivîl a Sûrî" kanîn vemiranda, piştî ku di navêna 03-06/06/2024an de ziyanin mezin gîhandin daristanê.

- Li 27-28/06/2024an. Z, agirek bi hirşekî li nêzîk Gundê "**Hechesna**" - N. Cindirêsê ket, û "Berevaniya Sivîl a Sûrî" tekez kir ku bi çetinahî vemirand; Û di wêneyeke belavkirî de kokên darên qutkirî diyar dibin, ji bo êzingkirinê û kombûna bermayên hişk.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Li êvara 15.06.2024an. Z, li Taxa Eşrefiyê - B. Efrînê, bi sedema kêşeyine navxweyî, di navbera anîndeyin ji "Qelemonê" - Gundewarê Şamê bi navê "Komelgeha Qelemon" û hin din ji Heleb de pevçûn û avêtina qurşînan çêbûn, û di encamê de mal û dîkanin hatin şewtandin û hin jî hatin talankirin, û hin kes jî birîndar bûn.

**-** Li êvara 19.06.2024an. Z, li nêzîk rêbenda derbasgeha Gundê "Maratê" - Rojavayê B. Efrînê, bi sedema nelihevkirinê li ser dizînan û çarçewa bandoriyê, pevçûnin mekin di navbera du giropên ji Milîseyên "Tîpa/Firqit El'hemze" de derketin, û di encamê de di nav herdu aliyan de hin birîndar bûn.

**-** Li 21-22/ 06/ 2024an. Z, di navbera du giropên Milîseyên "Feyleq El'şam" de pevçûnin derketin, sê rojan gizgiziyê berdewam kir, giropên "El'feyleq" ên bi ser "serkirdeya beşê Bakur" ve li Bajaroka "Meydanekbezê" û gundên "Meydana, Qerebaba, Xirabî Sûlik" û hin din li Navça Reco ketin seferbîriyê, û rewş kontirol kir; Pevçûnan li Gundê "Xirabî Sûlik" dest pê kirin, li dema ku aliyê serkirdeyê hewil da desteseriya xwe ferz bike û berpirsiyarekî giropeke perçebûyî bigire, û paşê pevçûn derbasî Bajaroka "Meydanekbezê" bûn, ew jî bi sedema perçebûna giropina ji "El'feyleqê" bû; Giropekê êriş bir ser biryargeha wê di Mala "Mistefa Edamî" ya desteserkirî de li Bajaroka Meydanekbezê, û di encamê de tirs kete nav sivîlan, ziyan gihîşte malê, hin endam birîndar bûn, û hin ziyanên şênberî gihîştin malmewdanên sivîlan; Û çar lîwa'an (400 endam di nav de) daxuyanek derxistin û têde vekişandina xwe ji "Feyleq El'şam" ragîhandin, û serkirdeya wê bi karanîna tengsîkirin û binpêkirinan li dijî wan tewanbar kirin.

Reşantiyeke ragihandinî li ser herêmê heye, û gelek binpêkirin û tewanên li Efrînê têne kirin aşkere nabin û natên şopandin û belgekirin ji aliyên têkildar û guhdankeran ve, û piraniya kesên armanckirî ji tirsa re newêrin tiştên têne serê wan ragihînin an jî giliyekî pêşkêş bikin, û bêdengdana birînên xwe çêtir dibînin, ji tirsa ku tûşî tiştên pîstir werin.

29.06.2024. Z – 2636. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Pakrewan "Cemal Elî kurê Mihemed Gulîn".

- Birîndarê xort "Mihemed Welîd Elîko".

- Du endam ji Giropa "El'hemzat" ên ku dijatî li ser herdu xortên ji "Dargirê" kirine, li ba Milîseya "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" seknandî ne, yek jê bi cilê sivîl e.

- Zarokê ku dijayetî li ser hatiye kirin "Ehmed Kamîran Miho".

- "Elî Xelef/Ebo Hebîb Xeşam" - Serperştkar û hevkarê komkujiya Newroza Cindirêsê 2023.

- Daxuyana "Hikometa Sûrî ya Demkî" li ser armanckirina derdora Gundê "Kiwêt El'rehme" li 16.06.2024. Z.

- Belavoka Serkirdeya Navendî ya Emrîkî li ser Pilatforma "ÊKS/X" li 19.06.2024an. Z, li ser kuştina serkirdeyê Da'işê "Usame Cemal Mihemed Ibrahîm El'cenabî".

- Şewatek li daristaneke Çiyayê "Bêkê" - Navça Bilbilê.

- Şewatek li Daristana "Hechesna" - N. Cindirêsê, û tê de kokên darine qutkirî diyar dibin.

--------------------------------------------

Malpera Fermî: www.yek-dem.net , Êmail: info@yek-dem.net